



Belavoka li ser Kursa Entegrasyonê/Tevlêbûnê

ji bo kesên ku neçar in beşdarî kursê bibin

- Penaxwazên ku li gorî madeya 55, beşa 1ê ya Qanûna Penaberiyê (AsylG) xwediyê destûra rûniştinê ne,
- Biyanîyên ku li gorî madeya 60a beşa 2, hevoka 3 ya Qanûna Niştecihbûnê (AufenthG) Duldung'a wan heye
- Biyanîyên ku li gorî madeya 60a beşa 2, hevoka 3 ya Qanûna Niştecihbûnê têkildarî Duldung'ê ji bo perwerdehiyê li gorî madeya 60c, beşa 1ê ya Qanûna Niştecihbûnê yan Duldung'a ji bo karkirinê li gorî madeya 60d, beşa 1ê ya Qanûna Niştecihbûnê Duldung'a wan heye.
- Biyanîyên ku li gorî madeya 24 ya Qanûna Niştecihbûnê yan jî madeya 25, beşa 5ê ya Qanûna Niştecihbûnê xwediyên destûra rûniştinê ne.

Birêz,

Hûn neçar in ku li gorî Qanûna Alîkariyên Penaberan û Qanûna Rûniştinê beşdarî kurseke entegrasyonê bibin.

Kursa entegrasyonê çi ye?

Kursa entegrasyonê ya giştî ji du beşan pêk tê, kursa ziman û ya nasandinê.

Di kursa zimên de hûn ê wan peyvan fêr bibin ku di jiyana rojane de pêdiviya we pê heye pê bi axivîn û binivîsin. Têkiliyên bi rayedaran re, sohbetên bi cîranan re û li ser kar, nivîsîna nameyan û tijîkirina forman tê de cih digirin.

Kursa nasandinê li ser jiyana li Almaniyayê zanyariyan dide we. Li vir hûn ê li ser pergala hiqûqî, çand û dîroka nêz a welêt fêr bibin.

Kursa entegrasyonê ya giştî ji kursa zimên a bi 600 beşên hînîkirinê (yek beşa hînîkirinê 45 xulekan dikişîne) û kursa nasandinê ya bi 100 beşên hînîkirinê pêk tê. Kursa zimên ji şeş beşan pêk tê û her yek ji wan 100 beşan pêk tê. Ji 300 beşên perwerdeyê yên pêşîn re kursa bingehîn, û ji 300 beşên hînîkirinê re jî kursa zimanê pêşkêftî tê gotin.

Kursên entegrasyonê yên taybet jî hene, wek mînak ji bo jin, dayîkbav, ciwanan û ji bo kesên ku baş nikarin bixwînin û binivîsin. Van kursan 1000 beşên hînîkirinê pêşkêş dikin.

Eger hûn bi taybetî zû fêr bibin, hûn dikarin beşdarî kurseke dûhev bibin.

Dezgeha ku kursên integrasyonê bi rê ve dibe, ku jê re "pêkhînerê kursê" tê gotin, berî ku hûn dest bi kursê bikin, dê bi we re ezmûna cihgirtinê pêk bîne. Ev ê diyar bike ka kîjan kurs û beşa kursê ji bo ku hûn dest pê bikin çêtirîn e. Ezmûna cihgirtinê belaş e.

Beşdarbûna li ezmûna dawîn

Ezmûna dawî ji ezmûneke zimên û ezmûneke di dawiya kursa nasandinê de, bi navê "Jiyana li Almanyayê" (Leben in Deutschland) pêk tê. Eger hûn di ezmûna zimên de têra xwe şarezabûna ser zimanê Almanî (asta zimanî B1) nîşan bidin û ezmûna "Jiyana li Almanyayê" derbas bikin, we kursa integrasyonê bi serketî qedandiye. Dûvre hûn ê "Belgeya Kursa integrasyonê" wergirin.

Eger hûn di ezmûnekê de yan di her duyan de bi ser nekevin, hûn ê bawernameya encama xwe wergirin.

Beşdarbûna li ezmûna dawîn belaş e.

Ji bo kursa integrasyonê bi pêkhînerê kursê re qeydkirin

Hûn ê ji nivîsgeha ku li gorî Qanûna Alîkariyên Penaberan berpirsiyar e ji bo sûdê erêkirineke nivîskî ya neçariya xwe ya beşdarbûna kursa integrasyonê (Verpflichtungsschein) wergirin.

Ji kerema xwe ji bo kursa integrasyonê li nivîsgeha ku ji bo we hatiye diyarkirin qeyd bikin û li wir belgeya neçarîbûnê pêşkêş bikin. Eger tu nivîsgeheke taybetî ji we re nehatibe diyarkirin, ji kerema xwe di zûtirîn dem de bi pêkhînerê kursê re li gorî xwe qeyd bikin. Di bawernameya neçarîbûnê de li jêr beşa "Neçarîbûna beşdarbûnê heya ... derbasdar e" dîrokek heye. Divê hûn berî vê rojê qeyd bikin.

Hûn dikarin li ser înternetê li ser vê navnîşanê pêkhînerên kurs û cihên kursê yên li herêma xwe û herweha şaxa berpirsiyar a Nivîsgeha Federal a li herêma xwe bibînin:

<https://bamf-navi.bamf.de/de/>

Ji bo misogerkirina tevlêbûna kursê ya di wextê xwe de, Nivîsgeha Federal dikare we bişîne cem pêkhînerê kursê ya taybetî.

Dema ku kursek tê payîn ku dest pê bike divê pêkhînerê kursê we agahdar bike. Divê kurs piştî qeydkirina we di nava şeş hefteyan de dest pê bike. Eger di vê demê de kurs pêk neyê, divê pêkhînerê kursê we agahdar bike.

Ji kerema xwe bizanin ku mafê we yê beşdarbûnê dê biqede eger hûn ji ber sedemên ku hûn ji salekê kêmtir piştî qeydkirinê berpirsiyar in dest bi kursa integrasyonê nekin an jî eger hûn beşdarbûna kursê ji salekê dirêjtir qut bikin.

Tevlêbûna rast di kursê de

Ji bo ku hûn bigihîjin armanca kursa integrasyonê, divê birêkûpêk beşdarî kursê bibin. Ev tê wê wateyê ku hûn heta dawiya kursê birêkûpêk beşdarî dersan dibin û ezmûna dawîn didin. Eger hûn

bixwazin, pêkhînerê kursa we dê bi nivîskî beşdarbûna rast piştrast bike.

Lênêrîna zarokan

Eger ji bo ku hûn beşdarî kursa entegrasyonê bibin hewceyê lênihêrîna zarokan bin, ji kerema xwe bi pêkhînerê kursê re têkilî dayînin. Ew ê we li ser bijardeyên lênêrîna zarokan ên heyî agahdar bikin.

Guhertina pêkhînerê kursê

Guhertina pêkhînerê kursê bi gelemperî tenê piştî qedandina beşeke kursê destûrdar e. Guhertin tenê di rewşên taybetî de gengaz e, nemaze di bûyera guhertina xênî de, guhertina di navbera kursên nîv-wext û temam-wext de, ji bo ku bikaribe lênihêrîna zarokan bike yan jî piştî qedandina beşa kursê dest bi perwerdehiyê yan karekî bi pere bike.

Eger hûn ji ber sedemeke din veguhezin, hûn ê civînên pola ku êdî tê de beşdar nabin bo beşa kursê ji dest bidin.

Di bûyera guherîneke destûrdar de, pêkhînerê kursê divê bawernameya pejiranbariyê vegeirîne û bide we.

Lêçûnên kursa entegrasyonê

Beşdarbûna kursê ji bo we belaş e.

Lêçûnên seferê

Wekî wergirekî sûdê li gorî Qanûna Alîkariyên Penaberan, hûn dikarin serî li Nivîsgeha Federal bidin da ku ji bo lêçûnên rêwîtiya xwe ya ji bo kursa entegrasyonê alîkariyê bide. Ji bo vê şert û merc ew e ku cihê kursê herî kêr 3 km dûrî mala we be. Alîkarî bi awayekî yekcar tê dayîn. Ji kerema xwe serîlêdanê bişînin şaxê Nivîsgeha Federal a ku ji herêma we ya niştecîbûnê berpirsiyar e. Hûn dikarin wan li ser înternetê bibînin li <https://bamf-navi.bamf.de/de/>.

Dubarekirina herî zêde 300 dersên kursa zimên

Di hin şert û mercan de, hûn dikarin 300 yekîneyên kursa zimên carekê dubare bikin. Ji bo ku hûn vê yekê bikin, divê hûn bi tevahî beşdarî kursa zimên bibin, dûvre ezmûneke zimên derbas bikin û nîşan bidin ku hûn têra xwe zimanê Almanî nizanin (asta zimanî B1).

Ji bo beşdarbûna demjimêrên dubarekirinê serîlêdanek pêdivî ye. Ji kerema xwe daxwaznameyê bişînin şaxê Nivîsgeh Federal a ku ji herêma we ya niştecîbûnê berpirsiyar e.

Eger tu kursa xwendin û nivîsînê werdigirî, ne hewce ye ku berê ezmûna zimên bidî ku 300 yekîneyan dubare bikî.

Êdî divê çî bizanin

Herwiha hûn dikarin hemû formên serîlêdanê yên ku di vê belavokê de hatine destnîşankirin ji pêkhînerê kursê, ji Tomara Navendî ya Biyaniyan an jî ji şaxa Nivîsgeha Federal a ku ji herêma we ya niştecibûnê berpirsiyar e, wergirin. Herwiha hûn dikarin formên li ser malperê bibînin li ser: <https://www.bamf.de/formulare>.

Herwiha hûn dikarin serîlêdanên xwe bi elektronîkî bi rêya Portala Federal bişînin Nivîsgeha Federal.

Serlêdanên jêrîn di forma elektronîkî de hene:

- Serlêdana ji bo pejirandina kursa integrasyonê
- Serlêdana pejirandinê ji bo dubarekirina herî zêde 300 dersên kursa zimên
- Serlêdana alîkariya lêçûnên rêwîtiyê digel dayîna mûçeyê rojane ya zêdetir

Ev girêdana înternetê dê we bigihîne serîlêdanên online ên li ser Portala Federal:

[Navnîşana Internetî bo serîlêdanên online](#)

Hûn dikarin hemû zanyariyên din ên li ser serîlêdanên online li ser vê navnîşana înternetê bibînin:

[Navnîşana Internetî bo zanyariyên ser serîlêdanên online](#)

Ji kerema xwe bizanin jî ku karûbarên şewirmendiya koçberiyê û hem jî karûbarên koçberiya ciwanan hene. Ew ê di serîlêdanan de ji we re bibin alîkar, bersiva pirsan bidin û pirsgirêkên we çareser bikin û dikarin ji we re kurseke integrasyonê ya guncan bibînin. Hûn dikarin li devera xwe li ku derê xizmetên şewirmendiya koçberiyê û karûbarên koçberiyê yên ciwanan hebin bibînin, an li Tomara Navendî ya Biyaniyan an li şaxê Nivîsgeha Federal li herêma xwe yan jî li ser înternetê bibînin li <https://bamf-navi.bamf.de/de/>.

Di belgeya zanyariyan de ji bo we zanyariyên herî girîng li ser beşdarbûna kursa integrasyonê heye. Pêkhînerê kursê jî dikare bersiva pirsên we yên din jî bide.

Dema ku hûn beşdarî kursa integrasyonê dibin hûn bi qanûnî li hember qezayan sîgorta nînin.

Beşdarbûna kursa integrasyonê tu bandorekê li ser prosedûra we ya penaberiyê nake.

Em ji we re serkeftinê dixwazin ku beşdarî kursa integrasyonê bibin!